Anne Ludvigsson

Amineh Kakabaveh

Pirsa zarokên girtî di wezareta derve ya Swêdê de

Parlamentera Sosyal demokratan ku ji komîteya mafê mirovan ya Turkiyê mesûl e, Anne Ludviqsson û parlamentera Partiya Çep Amineh Kakabaveh pirsa zarokên kurda di zindanan de anîne rojeva wezareta derve ya Swêdê. Parlamenter Ludvigsson û Kakabavehê ji Wezîrê Karê derve Carl Bildt bi şêweyekî resmî bersivên cewaz xwestin.

”Ji 2006 ve ji ber qanûnên terorê bi hezaran zarokên Kurda hatine girtin. Di dema girtinê de, li dijî wan şîdet hate bikaranîn û ji mafê awuqat û dîtina xizmên xwe mehrum hatine hiştin. Li gorî peymanên navnetewî ku mafê zarokan garantî dikin, zarok nikarin bi qanûnên terorê bêne cezekirin. Divê, Turkiyê zarokên girtî serbest berde û daweyên li dijî bi hezaran zarokên Kurda hatiye vekirin, hilweşin. Pir giring e ku, Yekîtiya Ewropa û Yekîtiya Miletan pirsa peymana zarokan cidî bigirin û vê yekê ji Turkiyê bixwazin.

Ji bo ku Turkiye paymanên navnetewî yê zarokan bi cî bîne, dê wezîrê derve yê Swêdê çi bike? Ji bo zextê deyne ser Turkiyê çi tedbîran wezîrê derve hene?”

Kampanya CHAK ê berfireh dibe

Kampanya Kurdocide Watch-CHAK ê dest bi qonaxa xwe ya duwê kir. Di vê çarçoveyê de, jibo ku raporek nû ji Anne Ludvigssonê re bê pêşkêşkirin, xebata cigirê serokê giştî yê CHAK ê Gabar Çiyan, didome. Her wisa kampanya îmzeyan di dawiya vê hefteyê de bi dawî tê. Hejmarek parlamenter, dezgeh û şexsiyet bi rêya campaign@kurdocidewatch.net ê beşdar bûn. Ji serekomar, serokwezîr, wezîrê edaletê, serokê meclîsa Turkiyê, her wisa ji wezareta derve ya Emerîka, Serokê demî ya Yekîtiya Ewropayê, Sekreteriya Yekîtiya Miletan re nameyek bê şandin, û ji wan bê xwestin ku dest bavêjin pirsê.

CHAK-Navenda Dokumentasyonê & EuroKurd News